


Şewba Koronayê SARS-CoV-2 Rêbaz û alîkarî



- Rêbeza Şewba Koronayê
- Ceribandina testê
- Rêzikên rêwîtiyê
- **Li Munîhê Perpûn**
- Pêşniyarên alîkarîyê
- Nameyek ji bo kesên ku testa şewba koronayê, bi erênî ye
- Name ji bo kesên peywendîkar yên pêketî



Rêbaz li ser Şewba koronayê li Munîh

Hikûmeta Federal û yên Eyaletan, li ser planeke biryar girtin, da ku sînardarkirina koronayê, sivik bikin.

Ev sînardarkirin bi "lambeya trafîkê ya nexweşxaneyê, wekî nîşana sîstemeka tendurûstî ya bar" û "bûyera 7 rojan" ve girêdayî ye

Lambeya trafîkê ya nexweşxaneyê: Gava di nav 7 rojên dawîn da, ji 1200î zêdetir kes, bi nexweşiyêke Covid-19, li **nexweşxaneyên** Bavyerayê hatibin bicîh kirin, ew tê wateyê, ku gihîştine "**lambeya trafîkê ya zer**". Ji wir pê ve jî, tedbîrên koronayê yên tund, yên wekî pêdivîya FFP2 maske an jî qedexeyên têkiliyê, wê bête bicîh kirin.

Gava ku ji 600 zêdetirî kes, bi nexweşiyêke Covid-19, li îstasyonên lînehêrîna zexm ên Bavyerayê da bin, ew tê wateyê, ku gihîştine "lambeya trafîkê ya sor". Ger lambeya trafîkê "sor" be, dikarin tedbîrên koronayê hîn bêhtir bîn sidandin.

Ji kerema xwe bi avayêke rêkûpêk ji xwe ra agahdarîyan werbigirin, ka lamba trafîkê gihîştîye kîjan astê û hûnê kîjan rêbazan bişopînin.

Bûyerên 7 Rojan: Ev tê vê wateyê, ku di nav 7 rojên dawî da, asta enfeksiyona şewba koronayê ya nû, ji bo 100 hezar niştecihan e.

Hûn dikarin nirxa bûyerê ya 7 rojî li bajarê Munîhê ya paytexta eyaletê, li ser internetê ya malpera fermî ya bajêr bibînin.

www.muenchen.de/rathaus/Stadtfinfos/Coronavirus-Fallzahlen.html

Wezareta Tendurîstî û Lînehêrtinê ya Eyaleta Bayernê li ser dirêjahî û rêbaznameyên nûjen, agahdarî dide.

www.stmgp.bayern.de/coronavirus

Rêbaza 3G

Li gelek cîhan rêbaznameya 3G'ê tê sepandin. Ev tê wê wateyê, ji bo kesên ku bi rêkûpêk **hatibin perpûnkirinê, testkirinê** an ji nexweşiyê COVID-19 **xelas bûne** destûra ketine tê dayîn.

Zarokên ku temenê wan ji 6 salî biçûktir û xwendekarên dibistanê nin, ji pêşkêşkirina belgeya testê azad in.

Kesên ku bi rêkûpêk hatibin perpûnkirinê an ji nexweşiyê xelas bûne, divê delîlên guncaw pêşkêş bikin.

Divê hemû kesên din, testeke antîjenê ya neyînî ya bilez, ji 24 saetan zêdetir nebe, testeke xweser ya di bin çavdêriyê da, an jî testa PCR ya neyînî ku ji 48 saetan zêdetir nebe, peşkeş bikin.

Erkên maskeyê

Maskeya bijîjkî, standart e.

Li derva, di bin hewa vekirî da, êdî pêdivîya maskeyê tune.

Di veguheztina giştî ya herêmi û hundir da, pêdivîya maskeyê heye.

Di odayên taybet da pêdivîya maskeyê tune.

Gelek kesên hewcedar, wek dîyarî maskeyên werdigirin. Ji kerema xwe li cîhê xwe an jî li navenda hemwelatîya civakî bipirsin.

Serlêdana awahiyên kal û pîran û dezgehên lînehêrîne

Divê kesên serlêdanê dikin, **maskeyek** bidin li ber dev û pozê xwe.

Bêyî nixên bûyerê, ji bo ziyaretvanan pêdivîya testê heye. Ji bo kesên ku bi

rêkûpêk hatibin perpûnkirinê an ji nexweşiyê xelas bûne, pêdivîya testê nîn e.

Girîng e ku karta perpûnlêdanê, her dem bête nîşandan.

Li gel amadebûn û alîkarîya ji bo kesên ber mirinê, destûr tê dayîn.

Gastronomî û baxçên bîra vexwarinê

Xwaringeh, ji bo mêvanan li hundir an jî derva, dikarin wekî berê kar bikin.

Li hundir, nirxên bûyerên 7 rojan ji 35î zêdetir bibe, rêbaza 3G yê tê sepandin: Beşdarbûn bi tenê ji bo kesên perpûnkirî, saxbûyî an testkirî ye!

Xwendekar bi nêrînek testên bi rêkûpêk ên li dibistanê, wek kesên testkirî têne hesibandin.

Girîng e ku karta perpûnlêdanê, an jî belgeyêke perpûnlêdanê her dem bête nîşandan.

Dibistan û lênihêrîna zarokan û zanko

Lênihêrîna zarokan: Awahiyên zarokan ya rojane û navendên lênihêrîna zarokan (baxçê zarokan) testeke daîmî vekirî ne.

Dibistan: Da ku pêşî li enfeksiyonên kesên ku ji rêwîtiyê vedigerin bête girtin, di çend hefteyên pêşîn ya destpêka dersan da, pêwîstiya maskeyê li awahîya dibistanê, her weha li cîhê rûniştandinê In sinifê da heye.

Ger nirxên bûyerê ji 35î zêdetir be, dersên rû bi rû jî çêdibin.

Lê belê, rêbaza erkên maske û her weha 1,5 metro ji hevûdu dûr sekinandin, derbas dibe.

Divê xwendekar, heftê du caran encameke negatîf ya testa antigen PCR an jî POC, bi awayekê nivîskî an jî elektronîkî, nîşan bidin.

Mirov dikare di dibistanê da jî test çêbike.

Agahdarîyên herî nû, ya li ser karûbarên dibistanê û nirxên bûyerê, dikarin li malpera înternetê ya bajarê Munîhê werbigrin:

www.muenchen.de/rathaus/Stadtverwaltung/Referat-fuer-Gesundheit-und-Umwelt/Infektionsschutz/Neuartiges_Coronavirus.html#Schule

Wezareta Perwerde û Çandî ya Eyaleta Bayernê, ji bo karkirina dibistanan a sala 2021an, bi zimanên cûrbecûr agahdarîyên gelemperî pêşkêş dike.

www.km.bayern.de/allgemein/meldung/7011/informationen-zum-schuljahr-202021-in-anderen-sprachen.html

Çalakîyên rû bi rû di **zanîngehan** da pêk tê.

Lê belê, rêbaza erkên maske û her weha 1,5 metro ji hevûdu dûr sekinandin derbas dibe.

Dibistanên muzîqê ji bo dersdayîna, vekirî ne.

Dibistanên ajotinê, dest bi kar kirin.

Pêşniyarên dersên dijîtal ên li ser înternetê, mimkun in.

Volkshochschule ya Munîhê, di awahîya xwe da dest bi dersan dike.

Çalakî û dema vala

Li hundir, nirxên bûyerên 7 rojan ji 35an zêdetir bibe, rêbaza 3G yê tê sepandin: Beşdarbûn bi tenê ji bo kesên perpûnkirî, saxbûyî an testkirî ye!

Xwendekar bi nêrînek testên bi rêkûpêk ên li dibistanê, wek kesên testkirî têne hesibandin.

- **Xizmetgûzarîya olî:** Ji bo hemû olan îcaze heye. Ger rêbaza 3G neyê hesibandin (îcaze bi tenê ji bo kesên perpûnkirî, saxbûyî an testkirî): Herî kêr 1,5 metro ji kesên din dûr bisekinin. Maskeyek li ber dev û pozê xwe bikin. Di dema rûniştandinê da be jî!
- **Çalakîyên çandî:** Ji bo çalakîyên li derva, heta 1000 kesî, rêbaznameya 3G, bi cih nayê. Ji bo çalakîyên ku ji 1000î zêdetir kes lê beşdar bibin, rêbaznameya 3Gyê bêyî bûyerên li hundir û derve, derbas dibe. Tenê kesên perpûnkirî, saxbûyî an jî testkirî, dikarin beşdar bibin.
- **Saziyên çandî:** Ji bo muze, şano, salonên konserê, dika, sînema, awahiyên bîranînan, arşîv û pirtûkxane, bûyerê 7 rojan ji 35 zêdetir be, rêbaznameya 3G derbas dibe.
- **Awahiyên betlanê:** Vê gavê wek mînak, baxçeyên zoolojî û botanîkî, parkên şahiyê, awahiyên werzîşê, cîgehên fitnesê, yarîyên lîstîkê yê hundir û wekî cîhê şahiyê ya awahiyên betlanê, cîhên avjeniyê, cîhên avjeniyê yê otêlan, germav, navendên xweşiyê, sauna û solarîum vekirî ne. Her weha, awahiyên qumar leyistinê, gasîno û dikanên lecê jî vekirî ne. Di cîhê sergirtî da, rêbaznameya 3G derbas dibe.
- **Tesîsên werzîşê:** Îcaze heye, ku werzîşên betlanê yê li der, bêyî sînorkirina hejmara beşdaran û bêyî îcbarîya testê pêkbê.

- **Çalakîyên werzîşê li cîhê vekirî, li derva:** Li cîhê vekirî bi gotineke dî li derva, çalakîyên werzîşê û çalakîyên din ên mezin, ji bo 25.000 kesan li gorî rêbaznameya 3G mimkun e.
- **Veguhestina giştî ya herêmî:** Pêdiviyên maskê heye, lê yê rêbaznameya 3G nîn e.
- **Geştyarî:** Li bajarê Munîhê, pêşniyarên akincîkirinê ji bo armanca geştyarîyê, dîsa gengaz e. Rêbaznameya 3G, di daxilbûnê û li 72 saetên pey wî ra derbasdar dibe. Destûr, ji bo serdanên gera bajêr û gerên bi rêberîyê jî pêk tên.
- **Klûb û dîskotek:** Tê payinkirin, ku ewana di meha Cotmehê da vebin.
- **Fuar:** Ji bo beşdarî, rêbaznameya 3G û pêdivîya maskeyê derbas dibe.
- **Komcivîn û civîn:** Ev, li gorî têgeha parastinê û paqijîyê, dikare heta 5 hezar mêvanan pêkbê.

Wezareta Navxweyî ya Eyaleta Bayern, agahdarîyên bêtir belav dike.

www.corona-katastrophenschutz.bayern.de

Dikan û xizmetgûzarî

Dikan, bi awayeke rêkûpêk vekirî ne. Li wir, pêdivîya maskeyê heye.

Hinek şirketên xizmetgûzarîya yê lênihêrîna laşî, ji nû ve tete vekirin.

Rêbaznameya 3G derbas dibe.

Bi awayekî gelemperî, peywendî bi dezgehê xizmetgûzarîyê a **rêveberîya bajarê Munîhê** ra, pêk tê.

Di wan dezgahan da, divê hûn her tim bi maskeyeke rêkûpêk li ber dev û pozê xwe bikin. Herî kêm 1,5 metro, ji kesên din dûr bisekinin.

Ji bo parastina enfeksiyonê, di dezgehên xizmetgûzarîyê da, bi pir kesan ra neyên ba hev.



Bi rêya Corona-Warn-App ra, ger hun nêzîkî kesek bi enfeksiyon bibin, dikarin di demek kurt da û bi awayeke anonîm agahdarî werbigirin.

Serlêdan dikare ji [App Store](#)-ê û ji [Google Play](#) belaş were daxistin.

Îmkanên testê/peywendî li gel kesên pêvedayî

Gava ku hûn diçin awahîyên bijîjkan an jî cihên ku test lê çêdikin, pêwîst e hûn maskeyek FFP2 li ber dev û pozê xwe bikin.

Herî kêr 1,5 metro, ji kesên din dûr bisekinin.

Divê hûn, di derbarê testa şewba koronayê ya li **bajarê Munîhê**, çî bizanibin:

- **Dikarin testa şewba koronayê, di awahîyên**

bijîjkan da jî çêdibin. Kesên ku li cem wan nîşanên (nîşanên nexweşiyê) wekî tayê, kuxikê û bîhtengbûnê hebin, dikarin li cem bijîjkên xwe testek çêbikin.

Kesên ku bîmeya tendûristîyê li cem wan tune, dîsa jî dikarin testek çêbikin. Pêdivî heye ku hûn berê, bi rêya tîlefônê randevûyekê werbigirin. Paşê hûn dikarin herin awahîya bijîşkê.

Maskeyek FFP2 û karta bîmeya tendûristîya xwe ji bîr mekin!

Muayenexaneyên bijîşkan, hûn dikarin li ser Internetê, li cem "Lêgerîna bijîşkan ji bo testa şewba koronayê" bibînin.

<https://dienste.kvb.de/arztsuche/app/suchergebnisse.htm?hashwert=a126d5d04b692b87be6ccbe3b2717826&lat=48.1351253&lng=11.5819805&zeigeKarte=true>

- **Ger Corona-Warn-App** bi rengeke sor "rîska zêde" nîşan dide, ji kerema xwe bi tîlefônê ji bijîjkên xwe randevûya testê werbigirin.

- **Stasyona testê ya Munîhê ya paytexta eyaleta Bayernê**, li ser Theresienwiese testa şewba koronayê pêşkêş dike, hûn dikarin bi otomobîla xwe ve werin û jê danekevin ("Drive-through"). Ji bo niştecîhên Munîhê, test belê in.

Ger hebe, maskeyek FFP2 û karta bîmeya tendûristîya xwe, bi xwe ra bînin.

Ji kerema xwe, tenê piştî çêkirina randevûyê, serî li stasyona testê bidin. Randevû ji we ra, dê bi SMS û e-mail ve bête birêkirin. Bi hejmara tîlefona xwe ya destan û navnîşana e-maila xwe ya kesane, tîlekevin înternetê.

www.corona-testung.de

- **"Mauayenexaneya Amade ya Enfeksiyonê"** li

Theresienwiese (li hewşê, Matthias-Pschorr-Straße 4) jî heye.

Bêyî ku randevûyek çêbikin, nexweş dikarin werin.

Ger hebe, maskeyek FFP2 û karta bîmeya tendûristîya xwe bi xwe bînin. Heft rojan vekirîye: Duşem, Sêşem û Pêncşem, ji saet 18:00ê êvarê heya 21:00ê êvarê.

Çarşem û În, ji saet 16:00 heya 21:00ê êvarê.

Şemî, Yekşem û rojên betlanê, ji serê sibê 10:00an heya 21:00ê êvarê

- **Testên bilez:** Wekî beşek bi navê "testên hemwelatîyê", her kes dikare bi kêmanî heftê carekî testa antigena bilez a belê çêbike.

Ev testên bilez, dikarin li dermanxane û navendên testê yê şexsî, bête çîbicîkirin.

Hûn dikarin li vir agahdar bibin, li kî derê dikarin testek bilez çêbikin:

www.testen-muenchen.de

Rêbazên ji bo encama testa erênî

Ger encamek erênî ya testê werbigirin, divê hûn tavlê xwe îzole bikin (karantîna) û testeke PCR çêbikin. Divê randevûyek werbigirin.

Karantîna, bi tenê bi pesendkirina encamek testa PCR ya ne erênî, bi dawî dibe. Ger ev test jî erênî be, divê hûn, tavlê daîreya tendûristîyê agahdar bikin.

Agahdarîyên peywendî yê beşa tendûristîyê:

Tel. 089 233 96333

E-Mail: infektionsschutz.gsr@muenchen.de

Wekî peywendîkar bi kesek pêvedayî (CP 1) ra, divê hûn 14 rojan li malê, di karantînayê da bimînin.

Da ku karantîna bi dawî bê, pêwîst e, ku encama testeke ne erênî pêşkêş bikin.



Rêzikên rêwîtiyê

Gava ku hûn ji deverek rîzîkoya bilind an şewbayek nû rêwîtiya Almanya bikin, ji kerema xwe hemû rêbaz û erkan cîbicî bikin.

Hûn dikarin listeyek ji deverên rîzîko bilind, di internetê da bibînin.

Hûn dikarin listeyek ji deverên bi xeter, di internetê da bibînin.

www.rki.de/DE/Content/InfAZ/N/Neuartiges_Coronavirus/Risikogebiete_neu.html

- Ji 1ê Tebaxa 2021an pê ve, hemî koçberên temen ji 12 salî mezintir, dema rêwîtiya Almanya, divê karibin belgeyek testê ya herî nûjen pêşkêş bikin, heya ku perpûnlêdan nekiribin, an jî an sax nebin. Heya nuha, pêdiviya testê, bi tenê ji bo sîyarbûna balafirê hatibû sepanandin. Nuha ew, ji bo rêwîtiya bi trêna, otobus, keştî û veguhastina kesane jî tê de, tevî gerîdeyê jî derbas dibe.
- Ger hûn ji deverek rîzîko bilind rêwîtiyê dikin, divê berîya rêwîtiyê, li ser internetê formek daketîna dagirin. Paşê hûnê belgeyek pejirandinê (PDF) werbigirin. Hûn dikarin, forma daketîna li ser internetê dagirin. www.einreiseanmeldung.de/#/register
- Hîn jî derbas dibe: Ger hûn ji deverek rîzîko bilind werin, divê hûn 5 rojan di karantînayê da bimînin. Ger hûn di dawiya 5 rojan da testek neyînî nîşan bidin, karantîna bi dawî te. Ger hûn perpûnbûne an sax bûne jî, divê belgeya testê ya herî nûjen û forma daxilbûnê dagirin. Tenê wê gavê karantîna 5 rojan dajo. Ji kerema xwe belgeya testê, li ser navnîşana jêrîn, bi e-mailê bişînin: corona-einreisende.gsr@muenchen.de

- Ger hûn li **deverek rîzîko bilind an deverek rûdanek bilind** rûbirûbûne, ji kerema xwe belgeya testa xwe bi e-nameyê bişînin. corona-einreisende.gsr@muenchen.de
- Ger hûn ji deverek bi **cûda cûda vîrus** rêwîtiyê dikin, pêwîst e hûn tavilê di malê da 14 rojan li karantînayê bimînin. Kurtkirina dema karantînayê, ne mumkin e. Ger hûn ji deverek ku şewba cûda lê heye, rêwîtiyê kiribin, ji kerema xwe belgeya testa xwe bi e-nameyê bişînin. virusvarianten-gebiete.gsr@muenchen.de
- Di hin rewşan da, ji bilî pêdiviya karantînayê îstîsna hene. Wezareta Tendûristiyê ya Federal, di derbarê vê yekê da bi gelek zimanan agahdarîyê dide. www.bundesgesundheitsministerium.de/coronavirus-infos-reisende/merkblatt-dea.html

"Çûnûhatina sînor"

Ji bo kesên ku ji 24 saetan kêmtir li deverek rîzîko bilind mabin an ji 24 saetan kêmtir rêwîtiya Almaniyayê kiribin, pêdiviya karantînayê tune.

Lê belê, kesê ku berîya rêwîtiyê di nav 10 rojan, li deverek şewbayê mabe, divê di karantînayê da bimîne.

Rêgezên perpûnlêdanê bi rêkûpêk

Kesên ku kêmtirîn 15 roj in, bi awayeke rêkûpêk bi perpûnek dijî Coronayê ya ku li Yekîtiya Ewropayê hatibe pejirandin, hatine perpûnkirinê û belgeya perpûnkirinê ya bi zimanê Almanî, Înglîzî an Fransî pêşkêş bikin, piştî mayîna man ya berê li deverek metirsiyê, li karantînayê namînin.

Heman tişt, ji bo kesên ku bi SARS-CoV-2 pêvadabin an nexweş bûne (testa PCR ya erênî) û bi rêkûpêk baş bûne jî derbas dibe. Rastbûna testa PCR ya erênî, 28 roj piştî dîroka testê, dest pê dike û 6 meh paşê jî bidawî tê. Piştî vê yekê, bi tenê pêdiviya perpûnek heye ku bi rêkûpêk bête pejirandin.

Bi tenê ev îstîsna, ger û bi qasî ku li cem kesê pêgirtî tu nîşanên enfeksiyona SARS-CoV-2 nebin û her dem karta perpûnlêdanê bi wan ra hebe.

Piştî mayîna li deverek ku cûreyek şewbayê lê hebe, ev îstîsna ji bo kesên perpûnlêdanê derbas nabe.

Li Munîhê Perpûn

Perpûn, bi dilxwazî û belaş e.

Gelek awahîyên perpûnlêdanê li Munîhê hene: Navendên perpûnlêdanê, çalakîya kampanyayên perpûnlêdanê, bijîşkên gelemperî, bijîşkên zarokan an bijîşkên kargehê.

Ji kerema xwe, ji bo perpûnlêdanê nasname an jî pasaportêke dirîst bi xwe ra bînin. Eger hebe, bi kerema xwe pasaporta perpûnlêdanê ya zer jî, bi xwe ra bînin.

Ger nexweşîyek dinê ya we hebe, ji kerema xwe belgeya bijîjkê bi xwe re bînin, ger li ba we hebe.

Kesên ku temenê wan ji 16 salî mezintir in û li Almanya dijîn, dikarin bi perpûnên pejirandî ve bîn perpûnkirin.

Di navendên perpûnlêdanê û hemû çalakîyên perpûnlêdanê da, ji bo BioNTech, Moderna û AstraZeneca, pêdivîya du car perpûnlêdanê heye. Lêbelê, divê di navbera perpûnlêdana yekem da hûn navberek bidin:

- **BioNTech** 3 hefte,
- **Moderna** 4 hefte,
- **AstraZeneca** bi perpûnlêdana mRNA 4 hefte.

Ji bo perpûnlêdana duwemîn, divê hûn pasaporta perpûnlêdana yekemîn (pasaporta perpûnlêdanê ya zer an jî sertîfîkata perpûnlêdanê) bi xwe ra bibin.

Her weha hûn dikarin bi **Johnson & Johnson** ra perpûnlêdana xwe bi cîh bikin. Pêdivî bi tenê perpûnlêdanekê heye. Madda perpûnê ya Johnson & Johnson, tenê ji bo kesên temen 18 salî û jê mezintir, tê pejirandin.

Perpûn di navenda Perpûnkirinê

Hûn dikarin ji roja Duşemê heta Yekşemê, ji saet 9ê sibê heya 17:45ê êvarê di navenda perpûnkirinê li Riem da, perpûnlêdana xwe cîbicî bikin. Dikarin bê randevû û bê qeydkirina malpera perpûnlêdanê, perpûnlêdana xwe cîbicî bikin.

Bi qeydkirina malpera perpûnlêdanê, hîn bi leztir çêdibe: <https://impfzentren.bayern/citizen/> Ji bo qeydkirinê, bi kerema xwe kesek ku bi Almanî baş dizane, alîkarî werbigrin.

Lêbelê hûn dikarin bi rêya tîlefonê jî randevû werbigrin: 089 90429 2222

Perpûn ji bo malbatan li navenda perpûnkirinê

Li Riem, navenda perpûnkirinê, ji roja Duşemê heta Yekşemê, ji saet 9ê sibê heya 17:45ê êvarê ji bo malbatan perpûnlêdanê pêşkêş dike. Ev pêşniyar ji bo zarok û ciwanên temen 12 salî û jê mezintir û her weha dê û bavên wan e. Bijîjk, wê şîretên berfireh bidin we. Pêwîst nîn e, ku mirov hevdişînek pêşîn pêk bîne.

Ez çawa dikarim biçim navenda perpûnlêdanê?

Navenda perpûnlêdanê li Messe München e: Paul-Henri-Spaak-Straße, Messehalle C3 (Eingang Nord – Tor 17).

Hûn dikarin bi wî awayî biçin:

- Bi seyare: Otobana A 94, xaçerêya 5 “München-Riem”, nîşana “Impfzentrum”, ji kolana Paul-Henri-Spaak-Straße bidomin, li Messehalle-Nord (Daketin ji derîyê 17). Ji bo parkkirinê gelek cîh hene.
- Bi veguhastina gelemperî: Xeta U-Bahn U2 heya rawestgeha Messestadt West an jî Messestadt Ost. Ji wir hûn dikarin belaş veguhastina busê ya MVG (MVG-Bus-Shuttle-Service, xeta taybetî 99) heya navenda perpûnlêdanê bikar bînin. Bus her roj, serê sibê saet 7:30 heta 19:30ê êvarê heye û 6–7 deqîqan carek birêdikeve. Hûn dikarin li ser Internetê, bêtir agahdarîya demjimêrê bibînin: www.mvg.de

Çalakîyên perpûnlêdanê li seranserê bajêr

Li seranserê bajêr, kampanyayên perpûnlêdanê têne pêşkêş kirin. Perpûnlêdan belaş e. Pêwîstîya randevûyê nîn e. Tenê bi asanî werin. Hemû kesên ku ji temen 16 salî mezintir in û li Almanya dijîn, dikarin bêne perpûnkirinê.

Ji kerema xwe, ji bo perpûnlêdanê nasname an jî pasaportêke dirîst bi xwe ra bînin. Tê payîn ku hemû maddeyê perpûnên pejirandî hebe. Piştî perpûnlêdanê, hûnê bi koda QR sertîfîkata perpûnlêdanê werbigrin û ew bi awayeke dijîtal wê li ser smartphona we be.

Hemû randevû û cih, dikarin li vir bibînin: www.muenchen.de/rathaus/Stadtverwaltung/Referat-fuer-Gesundheit-und-Umwelt/Infektionsschutz/Neuartiges_Coronavirus.html#Termine

Belgeya dijîtal a perpûnlêdanê

Navenda perpûnlêdanê li Munîhê, yekser piştî perpûnlêdanê sertîfîkata perpûnlêdanê ya dijîtal dide. Sertîfîkatên perpûnlêdanê dijîtal li navenda perpûnlêdanê wekî kodek QR têne çap kirin û têne dayîn.

Koda QR, li ser tîlefona mobîl, li Corona-Warn-App an jî li CovPass-App tê dîyarkirin.

Kesên ku berê li navenda perpûnlêdanê bi rêkûpêk hatine perpûnkirinê, dikarin belgeya xwe ya dijîtal, bi rêya hesabê xwe ji navenda perpûnlêdana Bavyerayê dakêşin û koda xwe yê QR, bi Corona-Warn-App an jî li CovPass-App bixwînin. impfzentren.bayern.de

Wekî din, kesên ku bi rêkûpêk hatine perpûnkirinê, dikarin di dermanxaneyan da belgeya perpûnlêdana xwe ya dijîtal werbigirin. Ew belaş e. Ger pasaporta perpûnlêdanê ya zer an jî sertîfîkata perpûnlêdanê, yê ku ji navendên perpûnlêdanê hatibin wergirtin, bête pêşkêşkirin.

Di malpera înternetê ya dermanxaneyan da, xuya dibe, ku kîjan dermanxane sertîfîkata perpûnlêdana dijîtal pêk tîne.

www.mein-apotheke.de

Bê guman, pasaporta perpûnlêdanê ya zer a klasîk, dê wekî delîla parastina perpûnlêdana koronayê bidome.

Bêtir agahdarî: digitaler-impfnachweis-app.de

Agahdarîyen di derbarê perpûnlêdanê li seranserî Almanya

Li ser perpûnlêdana COVID-19 a bi madda perpûna mRNA, hûn dikarin ji Înstîtuta Robert Koch (RKI) bi gelek zimanan agahdarîyên herî nûjen bidest bixin. www.rki.de/DE/Content/Infekt/Impfen/Materialien/COVID-19-Aufklaerungsbogen-Tab.html

Wezareta Tendûristî û Lênihêrinê ya Bayernê, di derbarê stratejîya perpûnlêdanê da agahdarîyan dide.

www.stmgp.bayern.de/coronavirus/haeufig-gestellte-fragen/#Schnellsuche

Komîserê Hikûmeta Federal ji bo Koçberî, Penaberî û Integrasyonê li ser şewba koronayê û parastina perpûnê, bi 22 zimanan agahdarîyan dide.

www.integrationsbeauftragte.de/ib-de/staatsministerin/corona

Bernameya “aidminutes.rescue (COVID-19)”, ji bo perpûnlêdanê ji zêdetirî 35 zimanan, bi awayekî dijîtal agahî dide.

Hûn dikarin, ji App Store û Google Play, belaş App peyda bikin.

<https://apps.apple.com/de/app/aidminutes-rescue-covid-19/id1507581865>

<https://play.google.com/store/apps/details?id=com.aidminutes.rescue.covid19>

Agahdarî û alîkarî

Agahdarî di derbarê şewba koronayê

Dezgeha Tendûristiyê ya bajarê Munîhê

Agahdarî bi pir zimanan, li onlinê:
muenchen.de/corona

Xeta hotline koronayê ya bajarê Munîhê

Agahdarîya li ser tîlefonê: 089 23396333

COVID Alliance – Multilingual-Online-Info

Agahdarîyên li ser şewba koronayê, bi Downloads û Pocket Guides, ji bo Smartphon, bi 30 zimanan:
www.COVID-Information.org

Navenda Mirovnasî û Tendûristiyê e.V.

Bi 26 zimanan, serîşteyên dijî stresê li jîyana rojane bi koronayê di nav malbatê da:
<https://mimi-gegen-gewalt.info-data.info/>

Navenda Federal ya Perwerdehiya Tendûristiyê (BZgA)

Li ser şewba koronayê û nexweşîya COVID-19, bi gelek zimanan agahdarî.
Malper: infektionsschutz.de/coronavirus/materialienmedien/informationen-in-anderen-sprachen.html

Pêşniyarên alîkarîyê

Psîkatriya Xizmetgûzarîya Krîzê ya Bayern Jor

Alîkarî ji bo kes û xizmên wan, yê ku pirsgerêkên derûnî rûbirû bûne. Ji bo her tîlefonkirine, mûçeya herî bilind 0.60 EUR ye. Rojê 24 saetan mumkun e. Tel. 0180 6553000

Isar-Amper-Klinikum, Klînîka Rojavayê Munîhê

Ji bo kesên ku pêdivîya çûyîna nexweşxaneyek derûnî ne. Randevûyên bi tîlefonê: 089 45620.
Malper: kbo-iak.de/index.php?fs=0

Bi tîlefon, şewirdarîya derûnî

Xem, pirsgerêk, an ramanên xwekujîyê? Şewirdarên derûnî, bi rêya tîlefonê guhdarîya we dikin. Tel. 0800 1110111 an 0800 1110222.
Her weha hûn dikarin e-mailek binivîsin an jî sohbetek bikar bînin. Tomarbûna li ser Internetnetetê: online.telefonseelsorge.de
Bi zimanên din, agahdarî li ser şewirdarîyê: telefonseelsorge.de/international-helplines/

Münchener Insel

Bi Almanî û Înglîzî, şewirmendîya krîzî û jîyanê bi tîlefonî, her weha bînavkirin. Ji nivê meha Çile sala 2021an, şewirmendî bi vîdeoyê jî heye. Di rewşên acîl da, piştî randevû wergirtinê, di cîh da dikare civînek bête çekirin.
Tel. 089 220041 an 089 21021848

Tîleфона alîkarîyê dijî şîdeta jinan

Alîkarîya jinên ku pirsgerêkên wan bi şîdetê hene. Şewirmend, di heman demê da ji bo peydakirina stargeheke jinan, dibin alîkar. Belaş û anonîm, 24 saet, şewirmendî bi 17 zimanan. Rojê 24 saetan heye. Tel. 08000 116 016
Malper: hilfetelefon.de/das-hilfetelefon.html

Trauma Hilfe Zentrum München e.V. (THZM)

Bi ezmûnên xirab ra bibin alîkar. Mirov, di qursan da fêr dibin, ku bi ezmûna xirab ra çêtir bijîn. Tomarbûna li ser Înternetê:
thzm.de/ressourcenorientierte-stabilisierungsgruppen/

Refugio München

Alîkarî ji bo zarok, ciwan û temen mezin, yê ku neçar mane welatê xwe biterkînin. Pêşniyar: Psîkoterapî, piştgirîya pêvajoya penaberîyê û sazkirina qursên ziman. Piştgirî ji bo peydakirina kar, perwerdeya pîşeyî an jî xanî. Tel. 089 982957 0
Malper: www.refugio-muenchen.de

Xizmetgûzarîya derûnî ji bo bîyanîyan ya Caritas

Şewirmendîyên belaş, bi zimanê zikmakî ji bo koçberên ji Îtalya, Yewnanîstan, Spanya, Portekîz, Amerîqa Latînî, Xirvatîstan, Sirbîstan, Bosna, Rûsya û Tirkîye. Li ser pirsên perwerdebûn, hevaltî, ji hev cihêbûn û berdanê pêşkêş dike. Her weha şewirmendîya derûnî ya civakî û şewirmendîya jîyanê. Bi rêya tîlefon an jî online.
Tel. 089 2311490
E-Mail: pds@caritasmuenchen.de

Xizmetgûzarîya derûnî ya Arbeiterwohlfahrt (AWO) Munîh

Şewirmendîyên belaş, bi destê psîko terapîstan, bi zimanê Bosnî, Xirvatî, Sirbî û Tirkî. Şewirmendîya takekesî û bi komî, li ser pirsên perwerdekirinê, zewac, malbat û rewşên kirîza kesane, têne pêşkêş kirin. Agahdarî li ser pêşniyar û broşurên pirzimanî:
E-Mail: psych.migration@awo-muenchen.de
Malper: awo-muenchen.de/migration/psychologischer-dienst

Donna Mobile

Şêwirmendîya ji bo jinan, zarok û ciwanan, di derbarê pirsên tendûristî û karkirina bîyanîyan (Bi têkefonê jî)

- Şêwirmendîya sozîyal-pedagojîk, bi Almanî û bi Tirkî
- Şêwirmendîya psîkolojîk, wek mînak bi takekesî, cot û terapîya malbatî bi zimanên Elmanî, Polonî, Macarî, Rûsî, Spanyolî, Yewnanî, Bulgarî, Îtalî û Înglîzî.
- Şêwirmendîya bijîşkî bi Almanî û Tirkî.

Tel. 089 505005, Malper: donnamobile.org

Ärzte der Welt e. V. – open.med

Alîkarîya tendûristî û şêwirmendîya civakî, ji bo kesên bê bîmeya nexweşîyê. Wegirtina randevûyê ji saet 9:30 ta 17:00

Tel. 0177 5116965

Malper: aerztederwelt.org/wem-wir-beistehen/hilfe-fuer-patientinnen

Navnîşan:

- Dachauer Str. 161, 80636 München.
- Behandlungsbus am Hauptbahnhof, Eingang Nord, Arnulfstr. 1-3., 80335 München.
- Bayernkaserne, Haus 12, Heidemannstr. 50., 80939 München

Xizmetgûzarîya Malteser/Tendûristîya Malteser ji bo kesên bê bîmeya nexweşîyê

Kesên bê bîmeya nexweşîyê jî dikarin li vir, ji bijîşk an pisporek bijîşkî alîkarîya tedawîyê werbigrin. Mînak di rewşên acîl, birîndar, ducanî. Bijîşkên zarokan, bijîşkên diranan, bijîşkên gelemperî û her weha ji bo jinan saetek şêwrê heye.

Ji kerema xwe randevûyek werbigrin:

Tel. 089 43608411

Navnîşan: Streitfeldstr. 1, 81673 München
malteser.de/fileadmin/Files_sites/Fachbereiche/Migranten-Medizin/Downloads/Flyer MMM.pdf

Navenda Refugee Stairway ya Diakonie Münih û Oberbayern (Mîsyona navxwe)

Alîkarîya sîdwergirtina ji pêşniyarên entegrasyonê. Mînak: Peywendî bi cîgehên pisporek, dezgehên pêşwazîyê û awahîyên komunal ra têkilî daynin.

Randevû: Tel. 089 1269915102.

E-Mail: rsc@im-muenchen.de

Klînîka koçberîyê (LMU), klînîk ji bo derûnnasî û psîkoterapî li Zanîngeha Münihê

Alîkarî ji bo kesên xwedan paşerojek koçberîyê, bi pirsgerêkên nefsi û derûnî. Îmkanên şêwirdarîyê bi çend zimanan heye. Tedawîyên:

- Depresyon, manî, psîkoz
- Nexweşîya stresê ya piştî trawmatîk
- Bêserûberbûnên verastkirinê û nexweşîyên fikarê
- Nexweşîyên tiryakê

Randevû: Tel. 089 440053307

E-Mail:

Migrationsambulanz.LMU@med.uni-muenchen.de

Navnîşan: Nussbaumstraße 7, 80336 München

IN VIA KOFIZA

Pêşniyar, tevger, çalakî û alîkarî li cem rayedaran. Ji bo jinên koçber, yê ten temen ji 18 salî mezintirîn, yê ku ji Afrîqa, Asya, Ewropa û Amerîqa Latînî tên. Ji kîjan netewe, ol û zimanê dibin, şêwirdarî jo bo hemû jinan tête kirin.

Tel. 089 5488895 0

E-Mail: kofiza@invia-muenchen.de

Xizmeta Civakî ya Jinên Katolik (SKF)

Piştgirî û şêwirdarî ji bo jinên pêdivîkar, şêwirdarîya ji bo ducanîyên temen piçûk, malbatên ciwan, xanîyên dayikûzarokan û hêwirandina ji bo jinên bêmal.

Tel. 089 55981-0

Malper: skf-muenchen.de/

Katholischer Männerfürsorgeverein e.V. (KMFV)

Alîkarî û şêwirdarîya kesane li ser bêmalîyê, li ser nexweşîya tiryak û li ser bêkarîyê.

Malper: kmfv.de/einrichtungen-und-dienste/einrichtungssuche/index.html

DIE ARCHE – Şîret ji bo di xetera xwekujîyê

Şêwirdarî ji bo ciwan û kesên temen mezin yê ku êdî nikarin jîyana xwe birêva bibin, ku nema dixwazin bijîn. Şêwirmendên ARCHEyê, bi kesên xwedî ramanên xwekujî û xizmên wan ra alîkarî dikin.

Randevûyan werbigrin: Tel. 089 334041

Malper: die-arche.de/

Tiryak Online, şewirdariya bi telefonê ji bo pirsgerêkên tiryakê

Şewirdarî li ser tiryak, wek mînak; tiryakîya alkol. Ji bo kesên bandor û malbatên wan, bi Almanî, Înglîzî, Fransî, Spanî û Îtalî. Şewirdariya bi telefonê an e-mailê.
Tel. 089 282822,
E-Mail: kontakt@suchthotline.info
Malper: suchthotline.info

BZgA – Li ser tendûristiya derûnî, şewirdarî bi telefonê

Li ser pirsgerêkên tendûristiya gîyanî, şewirdariya belaş. Duşem heya Pêncşem, 10:00ê sibê heya 22:00ê şevê. Roja Înê heya Yekşemê ji 10:00ê sibê heya 18.00ê êvarê.
Tel. 0800 2322783
Malper: infektionsschutz.de/coronavirus/psychische-gesundheit.html

Ji Munîhê, ji paytexta eyaletê, name û agahdarî

Ji bo kesên nexweş û pêwdayî

Hûn bi saya mada PCR ya bi nûjen a şewba koronayê (SARS-CoV-2) hatin testkirin an jî nexweşiya we ya hilmgirtina COVID-19 heye? Ji bajarê Munîhê, ji bo we nameyek. Biryarnameya giştî, pela agahdarîyê û rûpela berhevkirina daneyan.

www.mimi.bayern/index.php/muenchen-corona-alltag#flyout1

Ji bo têkilîya nêz bi mirovên vegirtî û nexweş re

Ma hûn kesek peywendîkar an jî endamek ji malbatê ya enfeksiyon girtî (Coronavirus SARS-CoV-2) an nexweşa (COVID-19) in? Nameyek ji Bajarê Münchenê ji we re. Biryarnameya giştî, pela agahdarîyê û rûpela berhevkirina daneyan.

www.mimi.bayern/index.php/muenchen-corona-alltag#flyout2

Impressum

Herausgeber*in:

Ethno-Medizinisches Zentrum e. V.
MiMi Zentrum für Integration in Bayern
80337 München
E-Mail: bayern@mimi.eu

im Auftrag von:

Landeshauptstadt München
Gesundheitsreferat
80335 München
E-Mail: gvo4.rgu@muenchen.de

Stand: 06.089.2021 | Version 014

Layout: eindruck.net, 30175 Hannover

Titelbild: peterschreiber.media/stock.adobe.com

Online: muenchen.corona-mehrsprachig.de

Sprachen: Verfügbar in verschiedenen Sprachen

URL-Verweise: Für Inhalte externer Seiten, auf die hier verwiesen wird, ist der jeweilige Anbieter verantwortlich.

Quellen: Gesundheitsreferat der Landeshauptstadt München, Bayerisches Staatsministerium für Gesundheit und Pflege, BMG, RKI, BZgA, KVB, StMUK, StMI, StMAS, StMWI, Covid Alliance

Übersetzungen: Dolmetscherdienst
Ethno-Medizinisches Zentrum e. V.

Presseanfragen:

Pressestelle Gesundheitsreferat München
presse.gsr@muenchen.de

Anfragen MiMi Bayern
bayern@mimi.eu
www.mimi.bayern

V.i.S.d.P.: Ethno-Medizinisches Zentrum e. V.



Landeshauptstadt
München

Unterstützt von:

